

Helbest Feratê Dengizî

KELA MÊRDÎNÊ

Pir pozbilind î
Pişta te li Zinara rengîn
Berê te li Beriya zengîn
Tu bereketa dîroka kurd
Emanetê 'Mêr û Dîn'
Mêtinger te fetisandin
Ji ber wê tim
Serê te bi ewr û xemgîn
Wek hêlîna bazê belek
Aşê felek
Pir bilind
Wek evîna 'Mem û Zîn'
Teht û lat û bircên te
Nişana serbestiyê
Bi axîn û dilbixwîn
Wek evîna Cegerxwîn
Li bende mizgîna me yî

Wek rexpêçanê / Wan sûkên teng û dirêj
Bêhna azadî jê tê / Herimand
Rom û erebên qirêj

Emperyalî te girêda
Bi têlên rêsayî û kumê spî
Lê reşkirin wek dilê xwe
Yê qirêjî
Lê tu Keyakser î dîl najî
Te azadkir
Gurmîna dilê hevalê Sebrî
Ne dût e
Bi nûr e
Şuştina te bi roja Medî
Bixemlîn e bihîvên xwe
Bi keskesor û zer êdî
Taştêyek li Nisêbîn ji Apê Mûsa
Firavîn li Deriyê Stewrê
Şerekî xweş li nivê kelê
Bes e ev bindestî
Axa te / Ava te / Xwîna şehîd
Govenda serbixwebûnê
Bi qêrîna keleşê / Li serê kelê
Bavêje ji ser xwe melûlî
Sazdibe li Kurdistan sosyalî
Jiyaneke wekhevî
Hesreta EGÎT Mazlûm Ferhat û Xeyrî
Kêfxweş e li gorê
Hevalê Sebrî

Adar 1997 / Ordî

TALANÎ BES E

Geh li ber Tîjle bi stûxwarî dinihêrim li keda xwe
Geh li ber bircê bikeser dinihêrim li dîroka xwe

Ka keda min xwêdana min bi ku de dihere
Bêxwedî ji xelkê re bi bereket dibuhure

Talan e zordariye nema ji min re tu par
De bêj Tîjle hewar Ferat ez dixwaz im alîkar

Zozan Serhed Dêrsim û Xerpêt kanî ye
Di kemile hasil û neft li Mûsil ew bi cî ye

Karker ez im cotkar ez im çavê min li derî ye
Rom û Ereb Tirk û Faris dest li ser daniye

Bagok Cûdî Nemrûd û Zagros xêrderî ye
Axa û beg şêx û keya nîrên mijokdarî ye

Xaka min dipelixe bi hovî û hercûmerc
Raperîn im hêdî hêdî ji berxwedanê re xerc

Xwedî Kawa û gurz im nadim keda xwe bes e
Hêz daye min Tîjle û Ferat ta ku dijmin bitirse

Amed Gebar şûrê min in serkêş Mazlûm û Mahsûn
Serî hildan pilingên Medya bi Rojê re tê serxwebûn

Şikest nîrê bindestiyê ar ket koka xiyanetê
Gemar şuştin agir û xwînê welat gihaşt selametê

Bi nirx û gewher dagirtî ye dîroka min
Nûr li enî Roj e serdar rih dayiye weatê min

15 Gelawêj 1997/ Ordî

WELATO

Min bêrya te kir
Min bêrya qesela te kir
Min bêrya bêhna qesela te kir
Qesela payîzî
Gihayê hişk ku nezar û newalan
Dike Bihuşta Zehra
Dewar û pez / di tavheyvê
Di hênekahiya sibehê de tê de diçêrin
Tew ku baraneke payîzî lê bê
Ez qilçixkî wê bimêjim
Ku em li ber deviyekê yan jî mêwekê rûnên
Bi qaçaxî
Goşik tirî yan jî qemçik hejîr bixwin
Destên me tev mezeloqî
Rahêjin nanekî ceh
Herin ser çem
Gepik nan û qulpik av
Gepik nan û qulpik av
Pez hatibe ser ava esirî
Û bêrî be jî
“Me re şivan bi çi nas dike..?”
Tasek şîr
Ku ji guhanê bizinê nûh hatibe dotin
Werê germ
Weke şîrê diyê..!
Weke ava heyatê..!
Ava nemirinê..!

Welato..!
Min çiqas bêriya te kir
Weke zarokê bêriya şîrê diya xwe kiribe..!

6 Avrêl 1999 / Ordî

TOV DI KÛR DE TÊ ÇANDIN

Ne xewn e û ne xeyal e
Di dilê axê'd jîyan e
Av weke rihê min e
Helbet ezîz û heja
 Xeta sor li dora min e
 Nakokî tovê min e
 Nemirin li benda min e
 Ronahî malik ava
 Roj xurtdibe bi xweşiyê
 Lê ew tim di tengasiyê
 Ger tu nediyê hêviyê
 Jîyan dê biçe ava
Tov di kûr de tê çandin
Bi sebrê tê hûnandin
Kes nabîne guherandin
Nîmete li ser kulava
 Axê ez sitirandim
 Avê ez behirandim
 Bayê ez qulipandim
 Rojê ez kirim zava
 Tava rastiyê ez im
 Şertariyê'd dibezim
 Li dûrgê teyrê baz im
 Derya bikin delava
Dewrêşê zanehiyê
Hurmuzê avahiyê
Ew dostê rojtengiyê
Kurmdarno mal ne ava
 Mîrinê min nasnekir
 Rihan tev dewrî hev kir
 Xweda û xweza ba hev kir
Got: Lê bikin silava
 Tu yî mejiyê bindesta
 Şervan hember zordesta
 Jîyan da te Avesta
 Rojzêrînê du ava

12 Reşemî 2000 / Ordî

EVÎNA MIN RONÎ YE

Ez di helbestan xeniqîm
Û di ronîya
 Di kûrayî û şewata çavên te de
Daliqîm

Xweliya agirê ku bedena min şewitand
Bû ronahî ronahiya çavên sebiya
Di wêde de li min bigere
Di xeleka porê sêwîyan
Li min bigere
Sêwiyên ku bêwelat in

Ez hesret im
Ez xemî me
Digerim li warê bêwelatan
Li warê bêevînan

Ew evînên ku bêbersiv
Û bêbedêl in
Bayê welatê ku tevî çiya ye
Bayê ku li guliyên dara
Li geliya û li nav lata
Li nav zinara
Digerin

Ez welat im
Evîna ku
Bi tîrêjên Rojê ve
Didaliqim

30 Kewçêre 2000 / Ordî

HOVÎTÎ BÊ SÎNOR E

Merheba hostê min hey hostê rêzan
Tu zanî me kişand pir derdên giran
Hînê jî'm dikşînin hayê te hebe
Li me zor bi qît e tevayê cîhan

Seydayê 'm te bang dikir l'heval Robson
B'dilê pak û hêvî j'bonî însan
Çi reşik çi spî wekhev û bira
Mixabin reşika mil da zordestan

Dan destê neyar serokê me kurda
Emperyal bûn yek reşik jî bi ser da
Ji bonî aşti rewş zehf dijwar e
Welat bi şewat 'Ciger xwîn' bi ser da

Apê me yî Mûsa kalê bi heybet
Birûmet ji me re j'gelan jî taybet
Wî ji me qetandin sîxur û kedxwar
Bû kulek pir kûr hey ji bîr nabe qet

Civak tije bûne bi pozgirîska
Bêvil her diweşin nabên namûs ka
Roja aştiyê hovîtî bêsînor
Ferat bibirîne bi derbên birûska

01 Rezber 2001 / Ordî

SILAV NAYÊN

Ez evîndar bûm li ser holikan
Li ber reza û li ber pêlikan

Wek Leyl û Mecrûnê li asîmana
Em xweş dijiyan li ber bîstana

Ez bûm Mecerûnê hov rî kurisî
Bêhiş li halê mêvana dipirsî

Dilîniyek kûr û bê çareser
Wek Memê ji bo Zîn derbeder

Lê tu xeber nadî timî sikut
Çav bi awir, dil bi keser, gotinê qut

Ne herêyê ne jî na, dil bi hevê
Silav nayne bayê sibê qutifî

Evîna min wek çirûskên agir
Sorivîn bariyan xemên min bir

Ew agirê çolwar û asiya
Li ber derî û li ber dêliya

Li ser taht û an li ber şikefta
Di kûreya an di paş zivînga

Diperitîne ciger bi evîn
Wek roj derê ji berbangê derivîn

Li benda te me li ber holikê
Cem bihîva sax bi dêlî ya dikê

Kulên bê çare ne xewna xidir
Yara delal weke Ferat bikşîn sebir.

4.Berfanbar.2001/Ordî

DÊRAN

Dikim ku li qoziyekê rûnê

Û

Serê xwe têxim navbêna herdû destên xwe

Û

Têra xwe bigirîm

Bi kesera deh salan

Û

Kelegiriya ewqasê sal

Belkî kesera min vala bibe

Û

Ez kulên dilê xwe verişînim

Lê mixabin

Ez nikarim

Ji ber ku

Ez

Zilam im

Kurd im

Şoreşger im

Serhildêr im

Kelegiriya xwe dardiqutînim

Bila bimîne

Dema ku

Li ser defa zik min xwe avête ser xaka welêt

Ez ê têra xwe bigirîm

Û

Axê bi serê xwe dakim

BÎDÊRÎM...

11 Pûşper 2003 / Dîlok

AV DIHERIKE KÛRAHIYÊ

Av xwe berdide kûrahiyê
Av ji kûrahiyê hez dike
Timî ber bi kûrahiyê ve
Gelo çima?

Her tişt, her candar
Tim dixwaze ber bi jor ve here, bilind bibe
Mirov, hewa, dirext, gir, xweza
Lê av ber bi kûrahiyê
Gelo nakokî ye!

An jî rastî ye
Ji ber ku wate û hebûn
Di kûrahiyê de ne
Her tişt di kûrahiyê de diafire
Lê paşê jî ber bi jor ve
Ber bi jor
Û
Jêr dibe qelsî, lawazî
Dibe radestî kirhî û gelacî
Lê azadî li jor e
Jor hebûna rihê azad e
Afîrîna tovê hebûnê...
Lewra tov di kûrahiyê de diafire
Lê li jor dijî û li wirê azad e

Ez jî dixwazim têkevim kûrahiya dilê te
Bibim tovê evînê
Bibim tovê heskirin û hêviyê

Evqas êş û elem
Evqas derd û bela
Tev ji bo vê

Ma tu zanî
Tu ji min re mîna avê ezîz î
Herwiha wek ku Tales jî dibêje
Bingeha jînê av e
Tu candarî, tu hebûnî, bêav nabe
Lewra xwe berdide kûrahiyê
Hebûnî jî paqijî jî tev av, tev bi avê

Nizam tê bîra te
Di berbangê de em li ber avê bûn
Me digot
Tu berbang mîna berbanga vê axê
 A vî welatî ne xweş e
 Ne rengîn e
 Û ne hestiyar e

Di hênekahiya dil de
Di hênekahiya siya çilo de
 Çiloyê berrûyê
 Devî an jî dar a berrû

Berbang li vir jiyana dilovan e
Mina dilopa avê
Dilopa bingeha jiyânê
 A evînê
Li Girê Şêran
Li Kûrahiyê
Û li Darka Sorçilo
Di kûreya kûrahiya dilê min de
Tovê aştiyê...

1 Rezber 2004 / Farqînê

KA

Ka dilê min warê te yê tije evîn û heskirin û dostî
Ka sozê te dabû min û dilzêrîn
Bêçare zeman çî xwest ji xwedawendan
Disekine dil û saet qet nasekine zeman
Hey zeman ez ê qet nebêjim êdî bisekine
Bêminet î biherike bi qed tu karibî
Heyîn çî ye çî ma ji tunebûnê
Di asoyê de demtariye tim û tim
Ma afirîne asîman û guman û hizirîn
Li ku ma hebûn û rastî û dilsojî
Ka bûyera afirînê rehman lê nerehîm
Qeharî serdestiye rehmanî jî koletî
Hebûn ma zelqa hişkî dilkenîn
Za ye ew hebûnê gerdûnê
Lê nemaye qet misqalê evînê
Hêvî qut bû hêvî nûza di germroja kemînê
Ew kemîna mêrkujê azadiyê
Doravê dike berdermanê birînê
Birîn kurmî ya bi hezarên salan
Hebûn he ye lê qet ne tu yî derman
Hezar kelim hezar selam li wargehê hebûnê
Hê negotine bingeha hebûn û tunebûnê
Encam zer e hebûn sir e za ye aşkeraya vê xwînê
Dilnêrmî û dilovanî ew hebûna vê rojê
Him hekîm e him jî dê ye lê ne bav
Tunebûn e xwedî zeman gav bi gav
Bes e dilê m bi aram be lê ne tirs
Tirs hebûn e ew e havênê azadî

Ka digotin heq edalet bû hakimê rûyî zemîn

1 Berfanbar 2006 / Amed

ÇIYA

War e
Yar e
Çiya
Zageha her hebûnê

Dar e
Ber e
Çiya
Wek dilê'm sorêtûnê

Kewî ye
Siyare ye
Çiya
Dergeha ewlehî yê

Dilîn e
Şabûn e
Çiya
Ew warê her evînê

Zar e
Bar e
Çiya
Dendika her zanînê

Dê ye
Bav e
Çiya
Kokeleya jiyînê

Şûr e
Mertal e
Çiya
Her warşerê aştiyê

09.09.2009-Amed

WELATÊ'M XWEŞ E

-Bi nerîna heval Elî li Amedê-

Pir hez dikim ji berbangên Amedê
Tew ku sirek bayê sibê yê Qerejdax jî hebe
Sibe bi rojê sor
Hêdî hêdî kuçe û sûk vedibe
Bi awaza mastfiroş û zarokên şêrînfiroş
Datlî..! Datlî..!
Dest pê dike bi zimanekî xerîb
Şerê jiyanê
Bêhnik din dê vebin bazarên debdebe...

Çayek sibehê û simîdek
Li Deriyê Mêrdîn yan jî li Deriyê Çiyê
Bêhnek xweş tê ji rûyê erdê
Û ji kaxizên Welatekî Nuh
-Yeni Ülke-
Mîna bêhna gul û beybûnan

Zarok û mezin bi lez û bez in
Berî ku panzêrên dijmin û Hizb-î Qontra
Bigirin qozîyan
Divê em birêsin rojeva demê

Da zarok serbixwe vexwin jiyanê
Silavan bidin Mazlûm û EGÎT
Û bibin rêhevalên
Zekiye û Bêrîvanê

Adar 1997/Ordî

NAPEYÎVIN

4 /10.Nîsan... / Zelê-Amed

Bêdeng in
Navserên çîyan
Av û robar
Berf û baran
Kaş û evraz
Dar û ber
Û xweşzelaliya kaniyan

Bêdeng in...
 Bayê serê çîyan
 Bagerên dol û newalan
 Ji tiliya xwe bêhdikin / bêhnakin
 Kew û kevokên berrî
 Ne bihawar in
 Dibên “Ma hawar e!”
 Bes di hestiyên me de biçêrin
 Şîr nema di pêsêrên çîya de
 Teba bêliv in
 Ne ji xirrê demê ye
 Şîrhelalî şîrheramî têkilhev
 Kel lêdixe, difûre zeman
 Diherike seleba çala te
 Tu di seleba çala demê de birrî
 Seleba çala bavê wê
 Firra avê nemaye ji şoreşê re
 Li benda kenê te
 Li hêviya dilopa dawî
 Ya xwîna te ne
 Bila kesek ji dêya te pê ve nebêje
 min çok da erdê û lawik anî!
 Zarok ji bo kenê te di lîskê de ne
 “Sant axa / Santir axa
 Qant axa qantir axa
 Hilifî milifî / Çarçûlifî...”
 Bes îşka me bişidîn bêdengî
 Ma te îşka xwe bi pîşt xist hey zeman
 Ka afirîna te hey ê mezin
 Av dernayê ji çalên me
 Bîrên me tev hestî ne
 Ne hestiyê xencera çilkezî
 Dil hinav mêlak û guncikên min / me radikin
 Ji pêncî û yek cihan
 Lê ew / em tovê jiyanê ne
 Mejiyên genî dinizile ji sermilên rutbedaran
 Zanistî ketûm û tirsonek
 Xwedêgiravî dem dema zanistî azadî û demokrasiyê ye
 Lal bêhtir bi ziman in
 Bipeyivin
 Tiştê ku Xwedê kiriye betal nabe

Çima hûn napeyîvin

14 Nîsan 2009 / Amed

AR

Ar
Aro
Arî
Arîn
Arîno
Aro birev agir hat te

Arîn Ervan
Ji Wanê jî hezdike bêguman
Nedin ser sênca wî
Ew e stûna ziman
Pêşê te çîye li vira
Maleve ma min xwest
Bayê darbişkêv
Ez kirim barê zeman
Zemanê zervanê zerzewan
Aro birev zilim hat te

Kumişî kokeleya derdan
Hilweşiya fêkî
Şala derd û xeman
Bizdonekî ne xem e
Wê pêrî te bê
Neke xelbxelb
Lêxê ji textikê êniyê
Bila nejî navno
Qêmîşî te nakim
Lê
Aro birev evîn hat te

Tu keyayê Mêrdînî
Li Delav
Bila kurederê bixwe
Ê ku caw çêdike
Ne Dengizî ye
A/Ê ku sifreya wê/î her tim ne li erdê
Dirya Xwedê
Azadwar be
Nebê 'şêra Xwedê...'
Berberiyê hert tim navbera
Mala Faro û Nêsir
Aro birev jiyana hat te!

12 Rêbendan 2012-Amed

DÎLBERÊ

Hê dîlberê gerdengazê
Lêvşêrînê awirbazê
Dil ji ber vê b'kazekazê
Bi qêrîn e di hezazê

Ev hezaza kûrawiran
Ketim bîra dilgawiran
Sêngûbera çêjhinguvan
Ev bejna ta spîdaran

Spîdara li Heskîfê
Bi xweşkêşa Selwadilê
Hiş ji min bir Melagulê
Bûme bengîn î bêhişgirê

Bejnûbala Zînxemilî
Dil ji min bir bi wî kenî
Ew awirên dilkulkulî
Sêngzozana xweş bigulî

Hê dîlberê hê segbavê
Te'z gêj kirim û avêt avê
Ev av dibe ta Mûsilê
Ez Siyabendê sing di dilê

Ramûsanek b'rihê min e
Bêj e herê îro ji mi' re
Ba rihîstin'k a li vir e
Fîda giyan qet ne kul e

Rengesmerê genimgunê
Takrihanê li ber min ê
Hiş û aqil çû wê dinê
Ketim bextê evîndilê

Çi sûc li min ev sewda ye
Bê sedem û bê lava ye
Sûc ku he be tev ê te ye
Ewqas rindî ma qey rewa ye

Hê dîlberê ez b'gorî
Carkê av bid' ser vî dilî
Emrê çuyî tu tê de birî
Ka keremke bisk û gulî

Ligel biskan lêvên şekir
Mêşhiguvbam ez li ser wir
Bi ked û hêzê mêjim nemir
Wek Melayî aqilê min bir

Dayê m qirka takrihanî
Deşta singê rengzozanî
Bixwim mizdim wek şîranî
Çêkim pênerê Heyderanî

Serê deynim ser wî girî
Derbas bibim nevala hûrî

Li girê din konvekirî
Emrê mayî b' rengbihuştî

Sal tev çirkin li wê xwezayê
Baevîni xweşî dayê
Qet ranezim li wê serayê
Hokim doşkim b'lorîndayê

Li lewqabihust xwe bipêçim
Bi bejna zirav xwe rapêçim
Dara bilind ez dorpêçim
Heta gorê ez mest biçim

Xweşawirê xweşbiberê
Ka em herin hebki derê
Xwebipêçim carkê b'tenê
Ez qayîlim bi sedxencerê

Jixwe xencer li ser dil e
Bi yekdîtinê hezar kul e
Dengizî bêhiş wer dikule
Dilê zîz e wek bilbil e

Ew bilbliê li ser latê
Lata Kelhê banê Tîjlê
Hêvya'm ew e tu azadê
Bextewar bî li vê dinê

Bo azadbî li jiyânê
Xwîn dirêje li meydanê
Kerem bike wer eywanê
Tu jî dengved' li Cîhanê

Bêje azadî evîn e
Ew evîna ku li dil Zîn e
Zîn azadê Memê dîn e
Ferat bes e dil birîn e

19.02.2012-Heskîfê

BÊ AZADÎ NABE

Ne mirina bi bombeyan
Ne aşîta berfe
Ne wesele weslebûna bedenê
Ne bêehlaqî û bêşerefiya Cîhanê
Min naxapîne

Ez agirê Newrozê me
Rihê jiyânê

Perpitandin bêheq e carinan
Av bi ya xwe dike û diherike
Zeman jî
Jiyan jî
Her tişt bi rêya xwe

Nabe

Lê bê azadî nabe
Bê rohnayî
Bê roj û tav
Bêyî agir
Qe nabe
Qet û qet nabe

Ez agirê jiyânê me
Rihê Newrozê

Avjiyana Girêşêran

Bê azadî nabe

13.03.2012-Amed

ÇILESİRÎN

28 Adar 2012-Amed

Bihar xweş e
Gula geş e
Her ji min re
Dilbiêş e
Bextê reş e

Lehengê min ma'î Gabarê
Femandarê dilê min
Dilê'm bi panzdeh gulbirînan
Bi kulîrkbihîvînî û elem
Li Hîzanê

Ev e çilesirîna dilê min
Baranbereket
Lê ji dilê min stewr
Kulîlik nabîşkuvin
Ducan bêhêz in
Ji bextêşiya welatê sêvî
Yê hêvî bişkuvîn

Herê çilesirîn
herimî bihara dilê min
Evîna te jî biesire
Bêhêran

Talan e çilesirîn
Wêran e
Zilm dibare li welatê min
Bi destên Tircalan

Axwînsor a perîsor
Û gulîsoran e
Milyaket dimirin
Hurînemir
Jiyan kezîkur
Giyan porkur
Û neman e

Çilesirîn
Li xaka welatê min
Ne jiyan
Lê man û neman e

KA EZ ÇI BIBÊJIM

Mirina li xerîbiyê
Xerîbiya bi darê zorê
Zora serdesta bêriyê
Bêriya xaka pîroz
Xaka livîna sar
Sariya germiya hebûnê

Çav li rê
Dil kovan
Awir melûl
Hêvî kedîkirî
Hêvî mehzûn
Hêvî Mezlûm û Mehsûn

Keda bêhempa
Ya jiyana bêxêr
Bêxêriya mêtîngeriye

Ka ez çî bibêjim
Mirina li xerîbiyê
Tu ocaxkor bî

Hevî azadî
Azadiya tav û Rojê
Azadiya key û keybanûyê
Azadiya newrozî ya pîroz

Herê mirin,
Ocaxa te kor be...

18.04.2012-Amed

Bi sedema mirina Hisoyê Dengizî (Hüseyin Turan) kekê birêz Adar Jiyan, ez mirina kedkarên li mişextiya zordarî, mirina li welatên biyanî, mirina bêkesiya bi hesreta welêt şermezar dikim...

ŞEKİR Û AZADÎ

Ji bonî Kendalê bişirîngangilokî

Ji gofretan hez dikir
Bi pirîn jî ji şekirên nav kaxezan
şekirên eydê

lê azadî şêrîntir bû

çend gofret
û kêsek şekirê nav kaxezan
li ber kêlika wî
bayê azadiyê silav dikir

şehkirina bayê çiyê
çiyayê azad
a porê wî yê sorsorkulîrik
û mizdana kêlikên wî

azadî û pevşabûn...

29.Avrêl.2012-Qesrik
Qesrika Nisêbînê

ÇI DEM

Çiqasî ji şevên biharê hezdikim
Tarî
Tariya ku tu tiliyan di çavên hev re rakî
Azman tev stêrk
Mîna te
Gewdê bê serî
Stêrka gavanan
Rêya kadizan
Leylê û pêrmêzên
Komika sêwiyan
Kelogiriya evîna min
Nizam çima ji te hezdikim
Stêrkên azmanê Girê Şêran
Mîna yên Rewandiz û Qendîl
Çima dişibin hev stêrkên asîmanê welatê min
Lê em ji hev cuda
Çima
Betilîm ji pirsên bêbersiv
Û
Gihayê hewşê tehl e
Tu yî stêrka sibê
Û
Ez im stêrka êvarê
Ya mixrubê...

Dagerîna bêserî
Bêdawiya elatrîkên beriyê
Yên Qamişlokê û Amûdê
Sirbangên xwekêşên Soran
Sorana gewre ya ku zordariyê ew kiriye Dîana
Sêrkêşê tu!
Ho yarê
De metirse
Evîn gerdûnî ye
Em tev gerdûnî
Em tev li hev helal in!
Ka ew roj!

Û

Ez hê jî evîndarê te me

Mîna Geliyê Elî begê

Hevrezanîn, kûrderdîn û qirkirina bira

Qirkirina dil

Na, na qirkirina evînê

Neyarê bedena xwe

Neyarê hebûn û evînê ye

Divê çareser bibe ev nakokî

Hê Mîr Mihemed

Ka ew soz!

Çiqasî ji reşî û kûrtariya çavên te hezdikim

Ez evîndarê du giran im

Tewş digere

Şev û roj!

22.04.2012/ Rewandiz

FATÊ / FATFATOKÊ

Şev dijmin e
Xew neyar e
Yara min

Hêza yekane ya mezin
Zerevan / Zerzevan / Zeman e
Diafirîne her kesî / her tiştî
Û tune jî dike
Herê
Zeman e
Yara min zeman
Zemanê bêeman û bêîman

Gelo tu çawayî
Li hemberî wî derdê kuldêran

Aliyekî min / me her tim kul e
Diêşe
Diêşim
Êş im

Ne zordarî
Tehdeyî û îşkencê ez êşandim
Lê pirs min diêşînin
Pirsên bêbersiv
An jî bersiv zor kor û no
Û dijwar...

23.04.2012 / Şingilban '06
Rewandiz

LO HEYRA!

Lo heyra ka bise!
Bes loma bike
Çi dihungiv û diesire
Di dil de
Va ye zilm dibare

Ka
Ka hişê hişyar î jîr
Barhilgirê têrqawet û têrzane

Lo heyra ka bise
Kê nefiro
Ax û rûmet bi geza nanî
Kê û ke xwe nefiro
Bûn neyarê şervanê/n azadiyê
Û kê rizgar kir çend gir an çiyayê xîrê
Ax û ax belaser e yê/a ku d(n)izane

Lo heyra ka bise
Kî yê xwedîgotin û pariyên mezin
Çi dike/in li welatên biyanî
Di koxa zilmê
Di pêxêla yarê
-Wele Kurdistanê we yar û diravên kesk in-
Meyfiroşên şoreşê
Aqildarên giran
Bi serîlêgeriyayî
ne sîtehlikek in jî
Û neyarên keda azadiyê
Tew bi ser de azadîxwaz û şoreşgerên mezin!
"Ez namirim bi vê derbê
Lê ez ê bimirim bi vê kerbê"
Ma ne zilm dibare

Lo heyra ka bise
Em dimirin
Em dadigirin girtîgehan
Em dibezin li çiyê
Hûn pesnê xwe didin!
Û
Hûn dibêjin Kurdistan!

Lo heyra ka bise
"Ê/A ku dizan e dizane
Ê/A ku nizane baqê nîskan e"

20.06.2012/Amed

BÊKES

Ji bonî Abdulwahîd Kiliçê dergevanê dilê min...

Wek gelê xwe
Tik û tenê
Hucreya tarî
Mîna jiyânê
Bi tenê
Tik û tenê
Wehîd..!

Zilma giran
Ku kêr da hestî
Berxwedan e
Serîhildan e
Jiyan jixwe şikestî
Herê
Wehîd..!

Bêkes
Lê ne bêumîd
Wehîd
Lehengê aştiyê
Herdem Egîd..!

14.07.2012-Amed

BÎRÊN RÛYÊ MIN

Bîrên rûyê min bêbinî ne
Ne çal ne hezaz
Ne jî dengiz
Bîrên mihînî mîna kefa destên min
Bêbinî ne
Birînê min
Lê rê nade ji qelşan

Vedişêrin qelş
Rê nadin
Mîna jiyane çendrû

Di bîrekê de çavnebarî
Ya din kurmê darê
Dexsî û ezezîti de wê de here
Bê cî mam dibê
Ew bîrên me kurdan
Herin venegerin

Rûyê min ranagirê birîn û dilêşan
Lewra xemgîn im
Mehdtirş û tirsok
Jan/Azadî wê valake van bîran

Lê êşa dilan
Êşa mejî

Xwedê bindestiyê nede tu kesî

07.08.2012-Amed

MIKURHATIN

Pûşkîn/1826

Ji Aleksandra Îvanovana Osîova re

Dixwazin bibêjin harbûnî
Dixwazin fedîtiya vala, û xebatek bêaqili be navê wê.
Bi vê kawikiya xwe yî bêsiûd;
Li ber lingên we gunehê xwe dibêjim;
Ji lewra ji we hezdikim.
Ne caîze boy navê min, ne ji bo emrê min...
Pêwiste bîaqilbim hêj bêhtir!
Belê nîşana ayanê jî;
Di dilê min de germa evînê heye.
Dema hûn ne li cem min bin,
Her tişt dilê min diguvêşe- dibawîşim;
Li cem we xemgînim- lê dikişînim
Min taqet nîne- lê dixwazim bibêjim,
Çiqasî ji we hezdikim, huriya min.
Kengî bibihîzim,
Li odeya mêhvanan dengê gavên we yî sivik,
An jî xwişîna libasên we, ew dengê bakîre û bêguneh,
Ji nûvde aqilê xwe wînda dikim.
Ger hûn devliken bin- dilşa me,
Lê bi vegera we- xemgînim.
Di dawîya rojek îşkenceyê de
Destê we yê şewitî xelata min e
Bixîret li ser gergefê rûdinin,
Delal xwe ditewînin bi ser de,
Ew çavên we û porên xelek,
Ku ber bi jêr de dihejin,
Nayê gotin germa agirê dilê min.
Bêdeng dimînim bi rihma dilan,
Mîna zarokê bi heyranî temaşe dikim!
Gelo ez ji we re behs bikim,
Car carinan çaxê di bin baranê de hûn dimeşîyan
Ji bêsiûdiya min, ji dexsiya êşa min
Gelo hûn ê pir bi dûr ve herin?
Lê ku di tenêtiyê de hêsirên ku we barandin
Gotinên ku di kuçeyekê di navbera
du kesan de
yan jî seyrana li Opoçkayê
êvaran piyano
Alîna! Bila dilê we bi min biêşe.
Ez nikarim parsa evînê bikim,
Belko, ji ber gunehên min huriya min,
Ez vê evînê heq nakim.
Lê her wekî ku hûn jî hezdikin
bifîzin rola xwe!
Ew awir dikarin her tiştî bînin ziman,
wek tiştên nebûyî pêkbîne!
Ax! Xapandin çiqasî hêsane,
Weke min ê ku xwe dixapîne
Ê ku wiha xwe bextewar dibîne.

Jêrenîşe: Min û hevalê Ûsiv Wesek li Girtîgeha Ordîyê ji Tirkî (mixabin) wergerandibû Kurdî. Çiqasî sebra me lê hatibû!

Li Êşan Digerim

Li êşan digerim
vê şeveqê
êşan didim hev
Dilê min Giyarê Maran

Bi tasika bafûn
dew vedixwim
Dewê bi nehne

Li derdan digerim li kolanên vî bajarî
derdan didim hev
dilê min Giyarê Maran...
Her dikele bi elem û jehrê!

Bi tasika bafûn
dew vedixwim
Dewê bi rexne

Êş har dikelin
Çima ji te hezbikim heyra
Tu di kozika neyar de
Herê guleyan bera min nadî
Lê wî xwedî dikî!

Bi tasika bafûn
dew vedixwim
Dewê bi lomê

10.09.2012-Amed

Zeriya Bêbext

Herê por zerê wey zeriye
Te gur berda nav keriyê
Mam ker û lal li ber deriyê
Li ku bibînim wê eniyê

Ew eniya zerîşveq
Ûryan gotê rind î tu heq
Ew bingeha hiş Enel-Heq
Naqede bo te ev teqereq

Teqereqa bi hezar salan
Hiş û dilê'm timî talan
Şûr winda ye maye kalan
Wa Siyabendê darxelatan

Sêdarxelatên azadiyê
Tu xêlya yî ku min nediye
Çavên dilê'm tu hebiyê
De êdî were xêrnediyê

Xêrnediya li vî xakî
Dîn jî bibim tu welatî
Heta jiya daîm baqî
Nadim gurên zirziqaqî

Tehta guran şematok e
Bejnûbalê bi indeko ke
Darka zavê xelîlok e
De bêbextê, navkî lêke

Navê zerê azadî ye
Gulîzera Kardoxî ye
Îro l'Qandîl nexîşiyê
Serxwebûna daîmî ye

Daîm hebî zerya dilan
Bi berbangê çav bi kilan
Li derî xe bê ez filan
Ferat berde hişaqilan

Aqil diçe evîn rast e
Berdêla wê her darbest e
Hezar spaz boy wê best e
Keda dilê'm jê'r heqdest e

15.09.2012-Amed

NE EW E

Çi dîlbera meşwerdekî
Dimeşe tê ji hemberkî
Bejinzirav memik sêvkî
A li bende me, na ne ev e

Porqemerî ya hez lalîn
Awirnermîna xezalîn
Lêvşekera dil binalîn
Çav dihebe, lê ne ew e

Wek kulîlka darbihîvê
Sor û spî rengwîzê
Serî rake bibînim qîzê
Qam dîlber e, lê ne ev e

Wek rihana serê latê
Ew porê zer çiqas lê tê
Çav hungivîn kezî zerê
Mizîlaq e, lê ne ew e

Gangiloka morbinevşîn
Sorgewezê dide min tîn
Nezer nebe çav birijîn
Qam dirêj e, lê ne ev e

Xwe bi zeriye xemilandî
Poz biçûkê nexişandî
Lêvtenikê kemilandî
Dil ji min bir, lê ne ew e

Reng esmera dilketimê
Lewqtenika lê lal mamê
Takrihana çiç'hinarê
Pir henûn e, lê ne ev e

Ez dildarê xweşikiyê
Evîndarê hezhebûnê
Rojzerîna heqîqetê
Wer li bende me, lê ne ew e

Kurdistan e navşêrîn e
Azadî li bejnê qîm e
Ji vê evîne hetikî me
Dizanim wê bê, lê ez ne ezim!

28.09.2012-Amed

Winda

Tizbiya min winda ye
We nediye gelo
Ji ber ku hişê min winda ye

Ê em nabin însan!
Ê ku em her tim serwerê xwe şîrîn bibînin
Û eduwê qewmê xwe bin
Hezar bi birçîbûne herin jî
ma çî ye!
nizanim
Ji ber ku hişê min winda ye

Yekî ku du gotinan dibihîse li ser serê me dibe alim!
cahil li kursiya aliman e
revok şervanên derewîn
dadigirin xezîneya neyarên xwe
û nabêjin çima
Hûn şer dikin, em dimirin!
Hew em keserê dikişînin
Ji ber ku hişê min winda ye

Berken Bereh bêheq nabêje
"Di binê roja xeyidî de
ewrên rûtirş hestên kal
payîz!"
Qira mêran hatiye
Arjen melûl û bêdûnde
Mirina hezaran jî
nalivîne tiliya mirovahiya demokrat!
naêşîne wijdanên bisilmanê "zureker!"
Ma birçîtiya bi sedan li cem wan çî ye..!
nizanim
Ji ber ku hişê min winda ye

Lê ez azadiyê dixwazim
Û ez ê bi ser bikevim
Ji Mazlum dizanim
Her ku mirovahî winda ye..!

09.10-03.11.2012 / Amed

FATEREŞKÊ

Lê Fatfatokê Fateresşkê
Ka em herin ber beresşkê
Serxweş bibin b'behna eşqê
Diyarî ye dewê meşkê

Dew bê nîvişk nabe
Lîska zêrîn dizanî kab e
Ku mîr neyê kes ranabe
Biskên reşik her bela be

Bi vê belayê ez qayîl im
Ji çavên reş re milayîm im
Zordestiyê'r ezraîl im
Azadxwazê Fata Mîr im

Zerî Fatê bi belê tê
Sedan bela b'bayê reş tê
Ev dil jê re weke taştê
Rengzêrînê bi ser dil tê

Dil bihara kulîlkan e
Xewna şêrîn a dilan e
Dil giyanê pakrewan e
Xakbihar mitêla wan e

Ew mitêla xemilandî
Tev kulîlkên şewitandî
Gangilokên fetisandî
Stûxwar û hetikandî

Hetka neyar pir ecêb e
Jiyana zilmî erzan kêb e
Li lûtkeyan vîn ê zêr be
Zardeştê kal rêberê vê be

06.12.2012-Amed

Bibêje

Ho şiaro
Lawê hezê
Bexê çiyê

Ka bibêje
Ma bera kulmek ax e têra mirov
Ji lewma kulmekê jî nadin me
Niha
Tu çêtir dizanî
Niha
Bi sonda şhrên te
Em ê ji kesî re jî nehêlin
Kulmek axa xwe...
Bihustek axa te...

De bibêje lo
Hê tu "Ar" di"jen" î
Bijen
Wê diyarî te be
Diyarekî seranser azadî...

Me bêrya te kirye!

09.12.2012 / Amed

NIZAM

Bi tenê me
Û nanê min bê xwê
Kurtêlxwiryê bavêje ser Sergoyê Simo

Ji bêhna bixûrê heznakim
Meblûdê dixê bîra min
Û mirinê
Mirin pir dilêş e li warê dilê min e
Dilê min an jî warê min î bêsiûd
Sewî
Bêkes
Û fûrjiyan î zindî

09-12.12.2012/Amed

Birîna Sê Çavîn

Ez nemînim
Sê birînên sêçavînin
Gurcika dilê min...

Sêçaviya serê min nakewe
Ne azadiya Parîsê
Ne jî wekheviya komûnê
Dilê min têr dike

Serê kaniya min Zagros
Dermanê birîna min Sara ye
Saraya serbilind a lûtkeya Tûjik Baba
Ya dilciwan
De debarkin
Piştî ewqasî êş
Bila biqêşite biratiya derewîn

Hê bêhtir evîndarê
Dil û awirên te me
Bila
Qeleş û kîndar
Hê jî
Zanibin
Kedxwar û mijokdar jî

Ligel sêbirînên sêçavîn
Evîndarê evîna te me
Şabaş ji te re
Keyneka Munzir
Ya esîl û asî û asê...

09/28.01.2013-Amed

Xwesteka Dawîn

Dara bihîvê, takekî dara berû û dêliyekê dixwazim
Li ber serê xwe, li ber kêlikê
Kêlika abadîn
û
Nîsan, Mizîlaqên Bizinan û yên Miyan û Beybûnan dixwazim
Li ser dilê xwe heta abadînê
û
Te dixwazim di dilê xwe de
Yara delal
Û
Kurdistan...
24.02.2013/Amed

Feratê DENGIZÎ